# Dersa zimanê zikmakî (HSU) li bajarê Bochum




hemû pêzanîn li jêr

www.bochum.de/schulamt/hsu

## Dê û bavên hêja!

Dersa zimanê zikmakî derseke bê beramber (belaş)e, ku herêma NRW pêşkêş dike. Ev ji bo wan zarokan e, ew ên bi du yan zêdetir ji zimanekî diaxivin, Anku ew ên bi zimanê Almanî û zimanekî zikmakî mezin dibin. Dersa zimanê zikmakî giringiyek taybet ji bo pêşkeftina kesayetiya zarokê/î heye. Armanc ji vê dersê ew e, ku şiyanên zimanê zikmakî ji alyê axaftin û nivîsînê ve bihêz bibin û werin berfireh kirin.

## Kengî û li ku derê dersên zimanê zikmakî tên pêşkêş kirin?

…zêdebarî dersên xwendingehê, zorbeya wan li danê êvarî tên pêşkêş kirin
…li gor rênmay yan di hefteyê de ji 3 heta 5 ders/demjimêr
…di hemû qonaxên xwendinê de her ji pola 1 ê heta pola 10 ê
www.bochum.de/schulamt/hsu.

## Bawername û ezmûnên zimän

Mamosteya/ê zimanê zikmakî pesenda beşdar bûnê dide xwendekara/ê beşdar. Nimra wan li ser bawernamê li jêr têbîniyan tê nivîsîn. Ji bo dawiya qonaxa navîn/amadeyî xwendekar ezmûneke zimanê zikmakî dike. Nimra baş ya zimanê zikmakî dikare bikeve ber nimra zimanekî biyanî, di encam de dê derbasî qonaxek bilindtir be.

## Tomarkirin/ xwe qeydkirin

Ji bo xwe qeyd kirina berwext hêvîdikin ku hûn her niha vê forma xwe qeydkirinê ya pêşwext dagirin. Hûn dikarin vê formê ji cem sikrêtarya xwendingeha zaroka/ê xwe bi dest ve bînin yan jî li ser rûpela (www.bochum.de/schulamt/hsu)û piştî dagirtinê carek din bidin sikrêtarya xwendingehê. Li destpêka sala xwendinê ya bê dê hemû xwendingeh li dor zimanên zikmakî bên agehdarkirin. Paşî dê xwe qeyd kirina dawiyê bi rêya mamosteya/ê zimanê zikmakî re were kirin.

Ji bo pirs û pêzanînên zêdetir, bi xweş halî ve em di xizmeta we de ne:


**rêveberiya perwerda bajarê Bochum**

kesê berpirsyar: Eylem Durus
Tel.: 0234 / 910-3883
E-Mail: edurus@bochum.de


STADT BOCHUM